



Rola Entelektuelên Fransî di Pêşketina Xebatên Kurdî û Rewşenbîriya Kurdî de¹

Sevda ORAK REŞİTOĞLU² & Necat KESKİN³

Received: Aug 3, 2024

Reviewed: Aug 19, 2024

Accepted: Aug 29, 2024

Kurte

Tevgerên Ronasans û Reformê yên ku di sedsala 15mîn li Îtalyayê de dest pê kiribûn ji her alî ve bandor li ser civak û çandê kirin û rê li ber serdemeke nû vekirin ku wek serdema Rewşenbîrî jî tê binavkirin. Şoreşa Fransî ya di 1789an de ku li ser bingehên fikrên serdema rewşenbîriyê pêk hatibû, bi xwe re gelek guherînên nû yên fikrî û civakî jî anîn ku bandor li welatên derdorê û rewşenbîrên gelên din jî kirin. Stenbol, paytexta Împaratoriya Osmanî, bûbû mekanê hevbeş ê rewşenbîrên ji nasnameyên cuda. Her wiha bi bayê azadî, wekhevî û biratiyê re, fikrên rewşenbîriya fransî jî belav dibûn û li paytexta Osmanî dihatin nîqaşkirin. Serdema dawî ya osmanî, ango berî hilweşandina Dewleta Osmanî, ji bo gelên di bin banê împaratoriye de destpêkeke nû û dema lêgerîna çarenûsiyê bû. Nûner û rewşenbîrên kurdan jî di vê demê de ketin nav lêgerînê ji bo çarenûsiya gelê xwe. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn, ew bi hevnasîna entelektuelên ji neteweyên cuda di vê riya xwe de meşîyan. Rasthatin û hevnasîna rewşenbîrên fransî ligel Celadet û Kamîran Bedirxan li Şamê, herêma di bin desthilatdariya Dewleta Fransî, rewşenbîriya kurdî ber bi asteke din ve hilkişand ku bi weşana kovara Hawarê (1932-1935 û piştê 1941-1943) bi encam bû. Bi riya vê têkilî û alîkariyê xebatên derbarê kurd, ziman û çanda kurdî derketin meydanê û dişa bi saya van tekilî, alîkarî û piştgiyaran piştî Hawarê, Ronahî, Stêr û Roja Nû (ya dawî li Beyrûdê) derketin. Bêyî alîkarî û piştgiyariya desthilatiya fransî û elitên fransî yên wê demê, ne pêkan bû encameke wisa derkeve holê. Û bi tevahî vê yekê rê li ber pêşketina rewşenbîriya kurdî jî vekir. Armanca vê lêkolînê ew e ku bi riya xwendina kovarên kurdî yên navborî û xebatên wan têkiliyên rewşenbîrên fransî yên wekî Roger Lescot, Pierre Rondot û Thomas Bois bi Birayên Bedirxaniyan re vekolin; û bi vî awayî rola wan di pêşketina xebatên kurdî û rewşenbîriya kurdî ya wê demê de nîqaş bikin.

Bêjeyên sereke: Xebatên kurdî, rewşenbîrên fransî, Şam, rewşenbîriya kurdî, Celadet û Kamîran Bedirxan, Hawar, Roja Nû.

¹ Ev gotar li ser bingeha teblixa bi navê “Rola rewşenbîrên fransî di pêşketina rewşenbîriya kurdî de” jî nû ve hatiye sewirandin û nivisandin. Teblix di sempozyûma *Nubihar Akademiyê* ya bi navê *Sempozyûma Navneteweyî li ser Ziman, Edebîyat û Zanistên Civakî -I* (4-5 Gulan 2024) de hatibû pêşkêşkirin. Gotar bi vî halê xwe li ti cihî nehatiye çapkirin.

² Ph.D., Institute of Living Languages, Mardin Artuklu University, Mardin, Türkiye; e-mail: sevdaorakresitoglu@artuklu.edu.tr, ORCID: <https://orcid.org/0000-0001-7662-9962>

³ Assoc. Prof. Institute of Living Languages, Mardin Artuklu University, Mardin, Türkiye; e-mail: necatkeskin@gmail.com, ORCID: <https://orcid.org/0000-0003-0884-1309>

Recommended citation:

Orak Reşitoğlu, S., Keskin, N. (2024). Rola Entelektuelên Fransî di Pêşketina Xebatên Kurdî û Rewşenbîriya Kurdî de. *International Journal of Kurdish Studies* 10 (2), 391-410,

DOI: <https://doi.org/10.21600/ijoks.1527699>

The Role of French Intellectuals in the Development of Kurdish Studies and Kurdish Enlightenment**Abstract**

The Renaissance and Reform movements that started in Italy in the 15th century affected society and culture from all sides and opened the way for a new era, also called The Enlightenment. The French Revolution in 1789, which was based on the ideas of the intellectual age, brought with it many new intellectual and social changes that affected the neighboring countries and the intellectuals of other peoples as well. Istanbul, the capital of the Ottoman Empire would become a meeting ground for the many intellectuals of the many identities. Moreover, with the wind of freedom, equality and fraternity, the ideas of French intellectuals were spreading and were discussed in the Ottoman capital. The last Ottoman period, that is, before the end of the Ottoman Empire, was a new beginning and a time of searching for a destiny for the people under the roof of the Empire. Among those identities, Kurds were represented and Kurdish intellectuals searched out the fate of their peoples at this time. After the First World War, they would tread down the new path they had discovered due to having made progress through mutual acquaintances with intellectuals from different nations. The meeting and acquaintance of French intellectuals with Celadet and Kamiran Bedirkhan in Damascus, the region under the rule of the French State, raised Kurdish intellectuality to another level, which resulted in the publication of Hawar, a literary magazine (1932 to 1935, then from 1941 to 1943). After Hawar, the situation of Kurds, Kurdish literature and Kurdish history gained strength. Through this contact and support studies on Kurds, Kurdish language and culture appeared. After Hawar, Ronahî, Stêr and Roja Nû (the latter one in Beirut) appeared, again thanks to such connections with their help and support. Without the help and support of the French authorities and French élite of that time, such a result would not have been possible. And altogether the way was also paved for the development of a Kurdish Enlightenment. The purpose of the present research paper is to

explore the contacts of French intellectuals such as Roger Lescot, Pierre Rondot, and Thomas Bois with the Bedirkhani Brothers through reading the mentioned Kurdish magazines and their works; and thus to discuss their role in the development of Kurdish studies and in the Kurdish Enlightenment in that time.

Keywords: Kurdish Studies, French intellectuals, Damascus, Kurdish Enlightenment, Celadet and Kamiran Bedirkhan, Hawar, Roja Nû

Destpêk

Tevgerên Ronasans û Reformê yê ku di sedesala 15mîn de li Îtalyayê dest pê kiribûn ji her alî ve bandor li ser civak û çandê kirin û pê re jî hem di warê hûnerê hem jî di warê felsefeyê de rê dan nêrînên nû; fikir û ramanên nû derketin holê ku di pêvajoyê de pêşiya serdemeke nû vekir ku wek serdema rewşenbîrî (The Enlightenment) jî tê binavkirin û ji gelek aliyan ve li ser bingeha “azadî”yê bilind dibû.⁴ Lewma jî gelekî di cih de ye Peter Gay binenavê cilda duyemîn a pirtûka xwe ya bi navê *The Enlightenment: An Interpretation* (Serdema Rewşenbîrî: Nirxandinek) wek *The Science of Freedom* (Zanista Azadî) datîne (1966/69).

Ev serdema Rewşenbîrî herwiha dibe rêvedanek ji bo Şoreşa Fransî (1789) ku şîarên wê yê sereke “azadî, biratî û wekhevî” di heman demê de bûn bingeha fikrên neteweperweriyê jî. Bi vî awayî jî fikir û ramanên rewşenbîrî û şîarên Şoreşa Fransî bi demê re û bi hevdu re bandor li ser rewşenbîrên ewrûpî û yê welatên din jî kirin. Bi taybetî jî ew rewşenbîrên ku dixwestin bibin xwedî welatek û neteweyek. Bêguman bandora rewşa fransî bi xwe jî li ser vê belavbûna fikir û ramanan heye, ji ber ku wê demê -qet nebe di nav rewşebîran de- fransî wek “lingua franca” bû.⁵ Wek mînak, em dibînin wê demê oryantalîstên Rusyayê, digel ku dûrî Fransayê ne jî, berhemên xwe bi fransî nivîsandine û her wiha Alexandre Jabayê ku bi xebatên xwe di nav qada kurdolojiyê de cihekî giring digire jî dîsa berhemên xwe bi fransî nivîsandine.

⁴ Li vir hêja ye mirov berê xwe bide gotara Kant ya bi navê “Bersivê bo pîrsa ‘Ronakbûn çi ye’” (‘Aydınlanma nedir?’ sorusuna yanıt) ku tê de balê dikişîne ser “azadî” û “azadbûna aqil”. Bnr. Kant (2024). <https://mkaymak.wordpress.com/aydinlanma-nedir-sorusuna-yanit-2/> (Lênerîn: 28.08.2024).

⁵ Li ser rewşa zimanê fransî ya wê demê û “lingua franca”bûyîna wê bnr. Wright (2006) û (2016: 134-135).

Ev fikir û ramanên ku ji Ewrûpa û bi taybetî ji Fransayê dihatin li Stenbolê, paytexta Împaratoriya Osmanî ku di nav xwe de gelek gel û etnîsîteyên cuda dihewandin, di nav rewşenbîrên demê de hin bi hin belav dibûn. Bi pirsgirêkên paşketina Împaratoriye re ev fikir û raman di nav rewşenbîrên tirkan de jî belav bûn. Ji aliyê din ve, ji ber ku Stenbol di heman demê de navenda çandî û fikrî bû, û rewşenbîrên hemû gel û neteweyan jî li wir di nav heman derdorê de bûn, ev fikir û ramanên nû bandor li hemûyan jî dikir. Di nav xebat û tevgerên wê demê yê rewşenbîrên kurdan de ev yek dikare bê dîtin.

Di serdema dawî ya osmaniyan de, bi taybetî jî bi tevgerên Tirkên Ciwan (Jön Türk), tê dîtin ku kurdan jî berê xwe dabû netewetî, pêşketin û modernîzmê û dest bi xebatên kurdî kiribûn. Kovar û rojnameyên wekî *Kurdistan, Kürt Teavûn ve Terakkî Gazetesi, Rojî Kurd* û *Jîn* ji bo nîqaşên bipêşketinê dibûn bingeh. Beriya van nîqaşan jî, bi tevgera Şêx Ubeydullah ya 1881ê û piştê jî bi weşandina rojnameya *Kurdistanê* di 1898an de hêdî hêdî di nav rewşenbîrên kurd de xwenaskirinek derdikeve meydanê ku Özoğlu vê yekê wek “xwehişyariyeke kurdbûnê” bi nav dîke (2009:33). Komeleya *Hêvî* û weşana wê ya fermî *Rojî Kurd* (û piştê jî *Hetawî Kurd*) dibin mekan ji bo nîqaş û bipêşketina fikir û ramanên netewî û her wiha dibistanên rewşenbîriyê ji bo xwendekar/rewşenbîrên kurd ên li Stenbolê.⁶ Vê demê neteweperweriya kurdan wek bertekeke li hember tirkitiya tirkan derdikeve meydanê (Keskin, 2017:49). Bêgûman hê di vê serdemê de jî mirov dikare behsa bandora “rewşenbîriya fransî” û şîarên *Şoreşa Fransî* bike wekî ku di nav yê tirkan de jî xuya dibe. Celîl, vê serdemê wek “ronakbûna kurdan” dinirxîne ku heya dawiya Dewleta Osmanî dewam dîke (2000).

Ev rewşenbîriya kurdan ku nû serê xwe der dida, ji ber rewşa giştî ya siyasî, bi taybetî derketina Şerê Cihanê yê Yekemîn rawestiya û gelek rewşenbîrên kurdan jî derbasî eniyên şer bûn wek serdarên leşkerî yê osmanî. Her çiqas piştî şer bi avakirina *Cemiyeta Tealî Kurdistan* û weşana kovara *Jîn* (û piştê *Kurdistan*) hewldanên kurdan dewam kiribin jî, bi damezrandina Komara Tirkiyeyê re ew jî nîvco dimînin. Piştî Komarê rewşenbîrên kurd an tîrî cezakirin an jî derdikevin derveyî welat û bi vê yekê re jî xebatên kurdî⁷ yê di nav xaka “Împaratoriya Osmanî” de radiwestin. Di nav wan kesan de ku berê xwe didin derveyî welat, du birayên bedirxanî, Celadet û Kamîran Alî Bedirxan, jî hene ku di nav rûpelên dîroka xebatên kurdî de cihekî giring

⁶ Ji bo dîrok û nîqaşên derbarê neteweperweriya kurdan de bnr. Jwadih (2004); Özoğlu (2004); Filiz (2023: 195-216).

⁷ Li vir ji “xebatên kurdî” mebest, ji yê polîtîk bêhtir xebatên derbarê ziman, edebiyat, dîrok û çandê ne. Ji ber ku xebatên polîtîk dewam dikirin. Her çiqas gelek caran kesayetiyên ku bi meseleyên “rewşenbîrî” re eleqedar, di nav meseleyên polîtîk de bîr xuyakirin jî.

digirin. Celadet Bedirxan û Kamiran Bedirxan ji ber rewşa polîtîk a nû di 1922yan de berê xwe didin Almaniyayê.⁸

Celadet di sala 1925an de vedigere Şamê ku wê demê di bin mandatiya Fransayê de bû. Li vî “welatê nû” an jî wekî kurd bi nav dikin “binxet”ê, gelek kurdên ji “serxet”ê, ango kurdên ji Tirkîyeya nû jî hebûn ku ji ber sedemên polîtîk mişextibûyî bûbûn. Wek Filiz (2023:44) jî îfade dike, entelektuelên kurd ên ku derbasî Suriyeyê bûbûn têkiliyên xwe bi kurdên Tirkîyeyê re nebirîbûn. Her wiha, ev kesayetiyên polîtîk, rewşenbîr xebatên xwe yê polîtîk li wir jî dewam dikirin. Di wê serdemê de rewşenbîrên kurd ên ku hema hema bi heman sedemê li Sûriyeyê gihîştibûn hev, xwe dabûn xebatên yekîtiyê. Wekî ku Jordi Tejel (2015: 44) diyar dike, hinek ji rewşenbîrên kurdan li mişextiyê dest bi xebatan kiribûn û armanca wan ew bû ku saziyên kurdan bikin tevgerê “neteweyî”. Xoybûn bingeha doktrîna belavbûyî ya li Sûriye û Tirkîyeyê bû. Roleke wê ya din jî ew bû ku li bakurê Sûriyeyê û li bajarên mezin ên wekî Heleb, Şam û Beyrûdê komîte û saziyên cur bi cur ên kurdan ava bike. Ji ber vê jî dikare wekî “dibistana” neteweperwer a kurdan bê hesibandin. Her wiha, rêberên Xoybûnê, bi taybetî Celadet û Kamiran Bedirxan, di ronansa çandî ya kurmancî de jî xwedî roleke eşkere bûn (r. 44).

Xoybûn bi endamên xwe yê ku hem ji rewşenbîrên kurd û hem jî ji kesên axa, şêx û serokên eşîran pêk dihat, neteweperwerî ji xwe re kiribû armanc (Gorgas, 2020: 12) û ber bi dawiya salên 1920î ve, di broşurên xwe yê propagandayê de, yê ku ji bo Ewrûpayê hatibûn amadekirin, îmajêke wisa derdixê holê ku kurd xweşbîn in, ne fanatîk in û nêzîkî rojavayê ne (r. 21). Lê belê armanca Xoybûnê ew bû ku serî hildin û esas bi ceribandîna serîhildanê, bi rêberiyên cuda û bi çekan bikevin nav bajarên Tirkîyeyê, ango “serxet”ê. Piştî bi sedemên cuda dev jê berdan ku ev jî bû sedema sistbûna rexistina Xoybûnê. Bi vê sistbûnê her çiqas dev ji çekan berdî jî bi awayekî din têkoşîna xwe berdewam kirin; vê carê berê xwe dabûn zimên. Nûkirina zimên, geşkirina perwerdeya kurdî û vejîna edebiyata gelêrî li gorî wan dê hesta gelê kurd geş bikira (r. 25).

Piştî têkçûna serhildana Agiriyê jî, bi taybetî Celadet û Kamiran Bedirxan, êdî berê xwe dan fikreke mayînde; ew êdî ji bo pêşketin û modernbûnê berê xwe bidana xebatên wekî ziman, çand û edebiyata gelêrî. Ji bilî têkçûna serhildanê, sedemeke din a vê biryara wan jî nîqaş û gengeşiyên di navbera endamên Xoybûnê de ye ku di heman demê de dibe sedema veqetîna hin

⁸ Celadet Bedirxan vê pêvajoyê heya vegera xwe ya 1925an di rojnivîskên xwe de nivîsandiye. Bnr. Celadet Ali Bedirhan (1995). *Günlük Notlar*. Stockholm

kesan. Wek mînak, Celadet û Kamiran Bedirxan ji aliyê madî ve tîne sîcdarkirin û ji ber vê di 1933yan de ji Xoybûnê vediqetin (Gorgas, 2020: 26)⁹ û êdî zêdetir berê xwe didin xebatên çandî. Vê yekê jî di Hawarê de- hinekî jî bi sitemkarî - wisa tîne ziman Celadet Bedirxan;

“Hawar jû pê ve bi her tiştê kurdanî û kurdîti pê pendewar e, dê mijûl bibe. Tenê siyaseta jê dîr e, xwe naêxe siyaseta. Hawarê siyaseta ji civatên welatî re hiştiye. Bi siyaseta bila ew mijûl bibin. Em jî di warê zanîn, hiner û sinhetê de dê bixebitin” (Hawar, hj, 1. 1932).

Ev xebatên çandî bi piştgiriya fransiyana tîne kirin û wekî ku di beşa bê de em ê li ser bisekinin, di weşandina xebatên bi vî rengî de rola *Enstîtuya Fransî ya Şamê* û entelektuelên fransî pir giring e. Di nav vê piştgiriya de alîkariyê madî jî heye (bnr. Sebrî 2013). Lewma jî em dikarin bibêjin ku tîkçûyîna Xoybûnê -an jî hema berî tîkçûyîna-, ji bo hin rewşenbîrên kurd riyên nû vekirin. Ew di wê baweriyê de bûn ku bi parastin û pêşvebirina ziman û çanda xwe dê bêhtir bi pêş ve biçûna. Rewşen Bedirxan jî ji bo weşandina *Hawarê* heman tiştî dibêje (Uzun, 2020: 67-69). *Gazinda Xencera Min* a ku di *Hawarê* de weşiyaye jî rewşa ku Celadet Bedirxan tê de bû bi awayekî dide hîskirin û bi awayekî hestiyarî tîne zimên ka çima berê xwe daye nivîsê (Bedir-Xan, 1998: 519-520).

Ji xeynî van Pierre Rondot jî behsa vê pêvajoyê dike bi neqilkirina Hamit Bozarslan. Li ser pirsên Bozarslan, Rondot behsa tîkiliya xwe ya bi Birayên Bedirxanî re dike û dibêje piştî tîkçûna meseleya Araratê, entelîjansiya kurdî careke din berê xwe neda tevgereke mîlîtarî, lê wan xwestiye zû bi zû berê xwe bidin xebatên ziman û çandî da ku wan biparêzin (Bozarslan, 2001: 74). Bi vî rengî hem xebatên kurdî zêde bûn û hem jî rewşenbîriyek di nav kurdan de bi pêş ket.

Di bin siya van agahiyan de em ê lê binêrin ka destpêkirina van xebatên ziman û çandî çawa çêbû, rîya ku şopandibûn çî bû, ya herî giring jî hevnasîna wan a bi rewşenbîrên fransî re çawa û li ku çêbû, vê hevnasîna bandoreke çawa li ser wan çêkir û ev dê bibin bingeha vê xebatê. Bi vî awayî em ê hewl bidin li ser van hûr bibin.

Di vê çarçoveyê de, ev gotar berê xwe dide serdema mandatiya Fransayê ya li Sûriyeyê û di vê serdemê de xebatên kurdî û yê hevpar ên entelektuelên fransî û kurdan. Bi gotineke din, bi weşana *Hawarê* dest pê dike û bi dawîbûna weşana *Roja Nû* ya 1946an jî diqede. Bêguman piştî wê jî hem xebatên hevpar ên entelektuelên fransî û kurdan û hem jî alîkarî û piştgiriya

⁹ Wexta ku em li sala veqetîna dinêrin, em dibînin ku berî veqetîna *Hawar* dest bi weşanê kiriye û ji ber ku di nav armancên Xoybûnê de fikirên ziman û çandî jî hene, mirov difikire ka gelo *Hawar* di bin banê Xoybûnê de dest bi weşanê kiriye, lê belê di *Hawarê* de em rastî tiştêkî bi vî rengî nayên.

entelektuelên fransî di avakirina sazî û dezgehên kurdî de dewam dike wekî avakirina kursiyê Zimanê Kurdî li INALCOyê û piştî jî damezrandina *Enstîtuya Kurdî ya Parisê*.

Her wiha, di wê demê de xebatên derbarê kurdan ên rewşenbîrên Fransî yên wekî Pierre Rondot, Roger Lescot û Thomas Bois û eleqeya van a li ser kurdan, têkilî û alîkariya wan a bi rewşenbîrên kurdan re û xebatên wan ên hevpar dê bîn nîqaşkirin. Bêguman, ew 'entelektuel' bi tena serê xwe ne 'entelektuel' bûn, di heman demê de jî 'karmend'ên Dewleta Fransî bûn û bi wezîfeyekê li wir bûn, lê belê li vir jî “wezîfe”ya wan bêhtir, dê li ser karîgeriya wan a li ser xebatên kurdî û rola wan a di geşedana entelektueliya kurdî de bê rawestin.

Li gorî me, taybetiyeke vê serdemê ji bo xebatên kurdî jî ew e ku rewşenbîrên kurd û yên biyanî -fransî- bi hev du re li ser kurdî û kurdan dixebitin. Rewşenbîrên fransî bi alîkariya xwe ya polîtîk, aborî û her wiha lêkolînê dihêlin ku xebatên kurdî zêde bibin, bi pêş ve biçin, bîn weşandin û belav bibin. Bi riya van weşan û belavkirinê jî ew asoya rewşenbîrî ya kurdî û kurdan jî geş bûye û bi pêş ve çûye.

Rewşa Sûriyeyê û Rewşenbîrên Fransî

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn hêzên hevalbend ku pêşketiya wan Îngilîstan û Fransayê dikişand bi serketin û xaka Dewleta Osmanî ku di nav hêzên Navend ên têkçûyî de bû, bû mijara parvekirinê. Di vê parvekirinê de jî ku bi piranî li ser bingeha peymanê eşkerebûyî ya Sykes-Picot bû, Sûriyeya “nû” û hinek aliyên “başûrê Anatoliyayê” jî ketibûn behra Fransayê. Fransayê li vê herêmê rejîmeke mandatî û di bin banê vê rejîma mandatî de jî “devlet”ên federal an jî xweser ên wekî *Dewleta Libnanê*, *Dewleta Alevîyan*, *Dewleta Durziyan*, *Dewleta Helebê* û *Dewleta Şamê* ava kirin ku hemû di bin banê rêveberiya mandatî ya Fransayê de bûn. Bi Peymana Lozanê ya 1923yan re sînorê di navbera Komara Tirkiyeyê û herêma di bin banê rêveberiya Fransayê (Manda) de hat diyarkirin. Ev rejîma mandatî heta 1946an dewam kir (Schmidinger, 2015: 54).

Helbet mandatiya ku Fransa li ser Sûriyeyê kir, ne tenê li ser ereban, lê belê li ser kêmnîyan jî bandor kir ku di nav van de kurd jî hebûn. Kurd di vî warî de jî giring têne dîtin, lewre wekî ku Nelida Fuccaro (2004: 579) dibêje, kurd gelê herî mezin ê herêmê ne, ango di nav wê civatê de ku yên ne ereb in.

Lewre, di vê pêvajoyê de ku qederê 26 salan dewam dike, wekî pêkhatayên din, kurd jî bi rejîma mandatîyê ya Fransayê re di nav tîkiliyê de bûn.¹⁰ Serokeşîrên kurdan; rewşenbîr û kesayetiyan navdar ên ku ji ber sedemên polîtîk û zextên Komara Tirkiyeyê reviyabûn li vê herêmê û bi taybetî jî li “Cezîre”yê -navê herêma Qamişlo, Heseke û Amûdê- bi cih dibin. Di vê maweyê de gelek ji wan di nav çalakîyan polîtîk, civakî û çandî de jî cih digirin. *Xoybûn* wê demê -1927- li herêma di bin rêveberiya mandatîyê ya Fransayê de tê damezirandin ku gelek endamên wê serokeşîr, rewşenbîr û kesayetiyan navdar ên kurd bûn ku ji Tirkiyeyê derbasî herêmê bûbûn.¹¹

Çalakîyan rewşenbîrî yê di çarçoveya vê xebatê de piştî salên 1930î dest pê dikin. Wekî li jor jî amaje pê hat kirin, di vê destpêkirinê de rewşa polîtîk a kurdan û bi taybetî jî tîkîlîna polîtîk rolekê dilîze, lê belê di heman demê de jî tîkîliya rewşenbîrên fransî bi rewşenbîrên kurd jî bandorê li vê yekê dike. *Enstîtuya Fransî ya Şamê* û eleqeya li hemberê kurdan a rêveberên wê rê li ber tîkîliyeke rewşenbîrî jî vedike.

Enstîtuya Fransî ya Şamê û destpêkirina xebatên derbarê kurdan de

Piştî ku Fransa li herêmê rêveberîyeke mandatî ava kir, pê re jî ji bo xebat û lêkolînên herêmê di sala 1922yan de li Şamê bi navê *Institut Français d'Archéologie et d'Arts Musulmans* (Enstîtuya Fransî ya Şûnwarnasî û Hunerên Îslamî) enstîtuyek hat avakirin. Enstîtu ji aliyê aborî û îdarî ve girêdayî rêveberîya Fransî ya Şamê û ji aliyê zanistî ve jî girêdayî Zanîngeha Parîsê bû. Di 1931ê de jî navê enstîtuyê wek *Institut Français de Damas* (Enstîtuya Fransî li Şamê) tê guhertin (Durmuş, 2000).

Armanca avakirina enstîtuyê ew bû ku lêkolînên zanistî li ser ziman, ol, çand û şaristaniyan gelên Sûriyeyê û yê welatên derdora wê bike û wan çap bike. Di vê çarçoveyê de di 1929an de ji bo ku xebatên hatine kirin parve bike, enstîtu bi navê *Mélanges de l'Institut français de Damas* (Berhevkirinên ji Enstîtuya Fransî ya Şamê) kovarekê derdixe. Piştî guherîna navê enstîtuyê, di 1931ê de navê kovarê jî wek *Bulletin des études orientales* (Bultena Lêkolînên

¹⁰ Ev mijara pêvajoya 26 salan, rûdanên polîtîk, tîkîliyan pêkhatayên erab, ermen, cihû, kurd û yê din bi nûnerên rejîma mandatî ya Fransayê re bi serê xwe mijareke serbixwe û berfireh e û ji sinorê çarçoveya vê gotarê derbas dike. Li vir bala me tenê li ser “tîkîliyan entelektuelî” ye û lewma jî em vê pêvajoyê tenê bi kurtasî derbas dikin. Wekî din ji bo agahiyên berfireh ên derbarê vê serdemê de bnr. McDowall (1998); Méouchy & Sluglett (2004); Tejel (2015); Schmidinger (2014).

¹¹ Ji bo agahiyên berfireh derbarê damezirandin, armanca û çalakîyan Rexistina Xoybûnê bnr. Alakom (1998) û Gorgas (2020).

Rojhilatî) tê guhertin (Durmuş 2000). Di bin banê enstîtuyê de gelek lêkolînên şûnwarnasî, tesbîtkirina berhemên dîrokî û her wiha lêkolînên derbarê zimanê erebî de jî tên kirin.

Di 1930î de Robert Montagne dibe serokê enstîtuyê ku heta 1938an dewam dike û bi hatina wî re jî hinek guherîn çêdibin. Ew di serî de, bi taybetî jî di warê etnografyayê de, dest bi weşandina xebatên zanistî dike (Métral, 2004: 217). Beriya Montagne, xebatên di warê dîrok, arkeolojî û piştire yên wekî ziman, wêje û îslamolojî û herî dawî jî ji 1930î pê ve xebatên hevçerx hatine kirin li enstîtuyê (r. 220). Li gorî Jean Métral, Montagneê ku di 1930î de hatiye Şamê berê enstîtuyê ji arkeolojî û hunerên îslamî ber bi enstîtuyêke zanistî ve guhestiye ku bêhtir xebatên erebî û etnografyayê hatine kirin. Ango enstîtu ji nû ve organîze kiriye û statuyên nû danê (r. 221). Wî bi xwe jî li ser gelê Cezîreyê di *Bulletin d'Études Orientales* de nivîs weşandine (Elisséeff, 1958-1960: 114).

Her wiha enstîtuya ku dîsa bi saya fransiyan hatibû damezirandin, ji bo gelên kêmine jî xwedî wate bû. Ango çawa ku ji bo erebî di warê çand û dîrokê de bipêşketinek dihat xwestin, ji bo kurdî jî heman awa bû. Tiştê ku dixwestin xebatên li ser çand, dîrok û ziman bûn. Bi hatina Robert Montagne û di dema serokatiya wî ya enstîtuyê de (1930- 1938) û dîsa bi pêşniyaza wî xebat û lêkolînên derbarê kurd û çanda wan jî dest pê kirin.

Destpêka Têkiliya Rewşenbîrên Fransî û Bedirxaniyan

Sîstema mandatiyê bû sebaba veguherîna hin tiştan. Rola rêvebirên fransî gelek mezin bû di damezirandina netewe-dewletên wekî Sûriye û Libnanê de û her wiha pênasekirina komên herêmî yên etnîk û dînî wekî kêmine dîsa di vê serdemê de çêbûye. Ev têgiheke nû bû û ji sîstema millet a osmaniyan hatibû girtin. Di nav misilmanên ku ne ereb û li Sûriyeyê dijîyan de kurd rêjeya herî mezin pêk dianîn (Tejel, 2015: 29-30). Ji ber vê, rêvebirên mandateriya Sûriyeyê li ser bipêşketina kurdan jî sekinîne û bi taybetî hewl dane ku li ser mijarên folklorîk, zimanî û çandî bixebitin.

Esas tam di vê serdemê de ye ku di navbera rewşenbîrên fransî û kurdan de têkiliyek dest pê dike. Wekî ku Tejel (2006: 3) jî diyar dike ev têkiliya ku bi taybetî bi Birayên Bedirxanî re çêbûye, rê daye ku pêkanîneke polîtîk a ku nîşaneya elîtîst a “sînoran” e çêbe an jî pêkanîneke nasnameya kurd e ku di nivê ewil ê sedsala 20mîn de çêbûye. Li gorî Pierre Rondot (1939: 123-124) jî -ku ew bi xwe di wê serdemê de li Sûriyeyê maye, bi kurdan re têkilî daniye û çavdêriyên xwe yên dîrokî jî bi navê *Les Kurdes de Syrie* di *Bulletin d'Études Orientales* de nivîsîne- cara

ewil e ku Fransa bi mandatiya Sûriyeyê, ji cîhana Îranê ya ku kurd tê de deriyekî ber bi rojavayê ve vedike.

Di vê serdemê de Fransa wekî hemwelatîyên Sûriyeyê ji aliyê, azadî, îmkan, toleransê ve alîkariya ekonomîk û çandî daye kurdan (Rondot, 1939: 124). Montagneê ku li ser bipêşketina Sûriyeyê li *Enstîtuya Fransî ya Şamê* xebat meşandine ji bo kurdan jî bê deng nemaye. Wekî ku me li jor jî diyar kir, kurd kêmîneya herî mezin a li Sûriyeyê bûn û dibe ku ji ber vê yekê Montagne bi giringiyeke mezin li ser wan jî sekinîbe. Sedem her çibe, wekî ku Gorgas jî diyar dike Pierre Rondot û Roger Lescot ên ku li wir wekî peywirdarên fermî yê dewletê dixebitîn, bi rênişandana Montagne dibin kurdologên ewil ên fransî (Gorgas, 2006: 5) û dest bi xebatên xwe yê derbarê kurdan de dikin.

Helbet kurdologên fransî yê ewil divê hin têkilî danîna da ku xwe bigihînin agahiyên kurdî û prensîbên wan ên sereke hebûn; yek ji wan têkiliya kurdî û fransî bû. Wan dixwest bi rewşenbîr û elîtên kurdan re têkiliyên xurt daynin da ku bi kêrî her du aliyan jî bê (Gorgas, 2006: 6). Bi vî awayî têkilî bi Birayên Bedirxanî- Celadet û Kamiran Bedirxan- re datînin û dest bi xebatên xwe dikin. Celadet û Kamiran hem zimanên ewrûpî dizanin û hem jî li Ewrûpayê mane û dikare bê gotin ku berê wan jî li “rojawa” ye ango modernîst in û di nav xebatên çandî de ne. Lewma jî têkilîdanîna rewşenbîrên fransî bi wan re ne tesaduf e. Wekî li cihekî din jî hatiye gotin, têkiliya wan di serê pêşî de di çarçoveya “wezîfe”yê de bû ji ber ku “rewşenbîr”ên fransî di heman demê de karmendên Dewleta Fransî bûn û bi mîsyoneke polîtîk li wir bûn.¹² Lê bi demê re têkiliyên wan bi kurdan re ji çarçoveya wê ‘wezîfe’yê dûr dikevin û ew dibin ‘heval’ û ‘dost’ên kurdan (Keskin, 2023: 8). Jixwe Rondot jî di rojnivîskên xwe de behsa têkilî û danûstandinên xwe yê bi kurdan re dike (bnr. Blau, 2000).

Ji xeynî xebatên wan ên serbixwe yê derbarê kurdan, wan bi rewşenbîrên kurd re jî xebatên hevpar kirine. Yek ji van xebatan a herî berbiçav *Hawar* e ku bi alfabeya latînî derketiye di 1932yan de. Taybetmendiyeke herî giring a kovarê jî ew e ku ji mijarên siyasî bêhtir mijarên çandî, rêzimanî û hêmanên folklorîk dihewîne. Wekî ku Barbara Henning (2021: 474) diyar dike

¹² Li vir dubare divê bê gotin ku rewşenbîrên fransî yê navborî di heman demê de karmendên Dewleta Fransî bûn û di serî de bi wezîfeyên polîtîk û leşkerî li herêmê bûn. Lê dîsa di heman demê de aliyekî wan ê “entelektuelî” jî hebû û wan li ser herêmê û gelên li herêmê gelek lêkolînên çandî û civakî yê sehayî jî kirine. Bê guman ev lêkolîn û xebatên wan di çarçoveya “oryantalîzm”ê û “oryantalîzma fransî” de jî dikarin bîn nixandînan ku bi xwe mijareke berfireh û hêjayî lêkolînê ye. Ji ber ku di vê gotarê de bal li ser têkiliya “entelektuelî” û keda wan a di pêşketin û geşedana xebatên kurdî û rewşenbîriya kurdî de ye, mijara "oryantalîzm"ê nehatiye nîqaşkirin. Her wiha, ji bo nixandîneke oryantalîzmê di çarçoveyêke dîrokî û polîtîk de li Lockman (2004) û ji bo nêrineke giştî li ser oryantalîzma fransî jî li Hosford & Wojtkowski (2010) dikare bê nêrin.

wextê Celadet û Kamiran Bedirxan kovar derxistine, wekî birayê xwe Sureyya nedane pey şopa *Kurdistanê* ya ku mamên wan derxistibû, ango cih nedane mijarên polîtîk. Ji xwe, wekî li jor jî amaje pê hate kirin, hê di hejmara pêşî de Celadet Bedirxan dibêje ku ew êdî “siyasetê ji civatên welatî re” dihêlin.

Ji aliyê din, ji ber ku ev kovar di serdema mandatiya fransiyayê de derketiye, girêdan û têkiliya bi fransiyayê re jî mijareke giring e. Helbet ji bo kurdan derxistina kovarekê ne ewqas hêsan bûye. Ji xeynê pirsgerêkên aborî û matbaayê, meseleyên din jî hebûne. Çawa ku Henning (2021: 473) diyar dike, Celadet Bedirxan wexta ku xwestiye *Hawar* derxe, ji rêvebirên fransî destûr xwestiye. Wan jî hê ji serî ve alîkariya aborî kiriye û sozek wiha jî dane ku heke kovar rêya fransîhez bişopîne, ew ê zêdetir alîkar bibin ji aliyê aborî ve. Ji xeynê vê şerteke fransiyayê ew bû ku nivîsên siyasî nenivîsin û nivîskar bi navê xwe yê resen binivîsin. Hêviya wan ew bû ku bi saya *Hawarê* dê bikarîbûna civaka kurdan kontrol bikin û bandorê li ser wan çekin (r. 473).

Wekî amaje pê hat kirin, têkiliya fransiyayê û “nûner” û rewşenbîrên kurdan di serê pêşî de di çarçoveya “wezîfeyê” de bû. Wek mînak, Pierre Rondotê ku di navbera *Hawar* û rêvebirên fransî de têkiliyeke navendî çêkiribû, di heman demê de kovar kontrol dikir û hewce bikira jî nivîs sansûr dikirin. Ev jî yek ji karê wî bû (Henning, 2021: 478). Ji vir jî diyar e ku *Hawar* di bin kontrola rêvebirên fransî de derdiket, ango em dikarin bibêjin tiştê ku rêvebirîya fransî dikir ne tenê alîkariya aborî bû, naverok jî divê li gorî dilê wan bûya. Wekî ku Henning diyar dike, *Hawarê* ji fransiyayê piştgirî girtibû, lê ne tenê di nav kurdan de, di nav ermenî û fransiyayê de jî belav bûbû û bi saya dîplomat û oryantalistên ku têkiliya Celadet Bedirxan bi wan re hebû, gelek aboneyên kovarê çêbûbûn (r. 477). Lê ev têkiliya “wezîfeyî” bi demê re reng guhert, regekî hevaltî û dostanî wergirt û êdî rê li ber weşanên din ên wekî *Ronahî*, *Stêr û Roja Nû* jî vekir.

Herçî *Roja Nû* ye, wekî ku li ser hatiye destnîşankirin, xwedî û gerîndeyê wê Kamiran Alî Bedirxan e. *Roja Nû* rojnameyeke hefteyî hatiye nişandan lê belê carinan derengtir derketiye û di navbera 1943-1946an de li Beyrûdê hatiye weşandin. Bi tevahî 73 hejmar e û her hejmarek jî 4 rûpelan pêk tê. Di her hejmarekê de rûpelek jî bo fransî hatiye veqetandin lê piştî hejmara 49an yek bi kurmancî yek bi fransî derketiye.¹³ Di vê rojnameyê de jî bala mirov dikişîne ku Roger Lescot nivîs û wergerên xwe weşandine.

Têkiliya Birayên Bedirxanî bi rewşenbîrên fransî re demeke dirêj berdewam kiriye û ev têkilî tenê li wan bajaran sînordar nebûye. Piştî çûyîna Rondot bo Fransayê jî têkiliya wan qut

¹³ Ji bo zêdetir agahî, bnr. “Çend Gotin li ser Roja Nû”, *Roja Nû*, Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1986, r. V

nebûye, Kamiran Bedirxan ji Beyrûd û Berlînê jê re name şandine û ji bersivan xuya ye Pierre Rondot jî jê re şandine. Her wiha Kamiran Bedirxan di nameyekê de destnîşan dike ku jê re gotinên pêşiyên dişîne, pîrsa pirtûka rêzimanê dike û hêviya çapkirinê jê dixwaze (Bozarşan, 2001: 91), ji xeynî vê di nameyê de behsa ferhenga kurdî-fransî dike û dipirse ka gelo dikare bingehêk ava bike ji bo çapkirinê (r, 92), behsa alfabe ya ewil û çend pirtûkên dibistanê dike û dibêje li ber çapê ne, ji ber vê jî, jê daxwaza piştgiriya dike (r, 83). Ji vê yekê jî diyar e ku ew têkiliya “hevaltî”, dostî û rewşenbîrî dewam dike ku bi vî rengî jî rewşenbîriya kurdî xwedî dike û rê dide xebatên hevpar.

Xebatên Hevpar ên Kurd û Fransiyayê

Her wekî li jor jî hatiye diyarkirin hevkarîya rewşenbîrên fransî bi yên kurdan re çêbûye û bi saya vê hevkarî, hevaltî û alîkariya aborî, kovar û rojnameyên wekî *Hawar*, *Ronahî*, *Roja Nû* û *Stêr* derketine. Helbet hem ji ber eleqeya wan a li hemberî kurdan û kurdî, hem jî ji ber Montagneî ku dixwest hem ereb hem jî gelên din ên kêmine yên ku li wir dijîn, di bin banê *Enstîtuya Fransî ya Şamê* de ji aliyê çand û zimên ve pêş bikevin, Pierre Rondot, Roger Lescot û Thomas Bois bi Celadet û Kamiran Bedirxan re xebatên hevpar kirine. Ango wexta ku em li van kovar û rojnameyan dinêrin em tenê nivîs û wergerên kurdan nabînin, yên fransiyayê jî cihekî girîng digirin di van weşanan de. Em dikarin bibêjin ku nivîsên van biyaniyan ji bo belavkirin û nasandina kurdan a di nav rojavayîyan de jî gelekî girîng e.

Rondot û Lescot alîkariyên gelek mezin kirine ji Birayên Bedirxanî re. Di serî de du bingehên vê hevkarîyê hebûn. Ji aliyekî ve girêdana kurd û fransiyayê bi wan kesan re mimkin bû yên ku xwediyê heman nêrîn û ramanê ne. Kurdologên fransî bi elît û kurdên perwerdekirî re têkiliyên dualî yên mayînde danîn ku ev têkilî bi kêrî her du aliyên jî dihat. Ji aliyê din ve jî bi qasî kurdologên fransî, li gorî kurdên ku berê xwe dane rojavayê jî, xilasbûna siyasî, exlaqî û madî ya gelê kurd ancax ji rojavayê bihata (Tejel, 2015: 54-55).

Wexta ku em ji vî aliyê ve lê dinêrin, rasthatina kurd û fransiyayê ji bo bipêşketina kurdan pir bi qîmet bû. Bi saya enstîtuyên cihê yên ku li Şamê ava bûbûn -ku yek ji wan *Enstîtuya Fransî ya Şamê* (1922) bû- xebat hatin kirin. Wekî me li jor jî behs kir Montagne wexta ku di 1930î de bû serokê enstîtuyê hin guherîn kirin û ji Pierre Rondot û Roger Lescot daxwaz kir ku li ser kurdan û kêmineyên din ên kurdan (yên wek êzîdîyan) bixebitin (Tejel, 2011: 1).

Li ser daxwaza Montagne, Pierre Rondot û Roger Lescot -ku di wê serdemê de pir ciwan in- li ser kurdan hûr bûn. Rondot li ser aliyên cihê yên civaka kurdan xebitî, jê wêdetir berê xwe da zimên jî. Li ser standardizasyona kurdî û alfabeyên cuda xebitiye, yên ku li Sûriye, Iraq û Sovyetê (YKSS) hatine bikaranîn. Piştî ku mandateriya Fransayê qediyaye jî Rondot dev ji xebatên xwe yên li ser kurdî bernedaye. Lescot jî berê xwe daye xebatên dînî, derbarê êzdiyan de lêkolîn kirine di 1936an de, lê belê pirtûka wî di 1975an de derketiye. Ji xeynî vê li ser ziman jî xebitiye, wekî ku em dizanin berhemeke rêzimanê ya ku bi Celadet Bedirxan re amade kiriye, gihîştîye roja me (Lescot, 1970). Ji xeynî van li ser çîrokên kurdî jî xebitiye (Tejel, 2011: 2).

Helbet xebatên wan geşedanek daye kovarên kurdî yên serdemê. Ji aliyê zimên ve dîsa rola Montagne xuya dike di van xebatan de. Bi erêkirina wî, Pierre Rondot bi Celadet Bedirxan re dest bi xebatên sererastkirin û başkirina kurmancî kiriye di *Hawarê* de. Her wiha Roger Lescot jî bi Kamiran Bedirxan re ferhenga kurdî-fransî amade kiriye, ji xeynî vê di *Hawar* û *Roja Nû* de nivîsiye. Em dizanin ku ev her du biyaniyên ciwan jî ji bo karên xwe yên fermî hatibûn wan deveran, lê nasandin, geşkirin û xurtkirina zimanê kurdî ji bo çî bi qîmet bû?

Wekî ku Tejel radigihîne, têkiliya Rondot û Lescot ya bi Birayên Bedirxanî re ewil li ser agahîdanê çêbûye. Ango wan agahî radigihandin ji bo wan her du biyaniyan. Lê piştî bûne çavdêr û hevkar di pêşxistina zimanê kurdî de (2011: 2). Ev hevkarî di weşanan de bi awayekî eşkere xuya dike û wekî ku em dibînin *Hawar* bi rêveberiya Celadet Bedirxan derdiket û li gorî Gorgas pênase dike *Roja Nû* jî bi awayekî xurt bi kesayetiya Kamiran Bedirxan re girêdayî bû û ji ber ku Celadet Bedirxan, Qedrî Can, Osman Sebrî û Cegerxwîn bi rojnameyê re ewqas eleqedar bûn, bingeha wê bi ya *Hawarê* re heman bû. Lê ferqeke giring hebû, nivîsên fransî yên di *Roja Nû* de ne wergerên ji nivîsên kurmancî bûn, bi gelemperî ji naverokên cuda dihatin nivîsîn (Gorgas, 2014: 849).

Li gorî vê nêrînê nivîsên fransî yên di *Hawarê* de wergerên yên kurmancî ne, lê belê wexta ku em bala xwe didinê beşên ku li ser alfabeyê hatine nivîsîn werger in an jî ji nû ve bi fransî hatine nivîsîn. Em nikarin bibêjin ji sedî sed werger in, lewre hin cudahî hene di navbera her du zimanan de. Her wiha, rêzenivîsên di bin sernavê “Le Folklore Kurde” (Folklorê Kurdan) di hejmarê 3yan de dest pê dikin û di çend hejmaran de berdewam dikin, lê kurmanciya wan tune ye. Ji xeynî vê di hejmarê 4an de di beşa fransî de agahî tê dayîn ku dê wergerên edebî jî cih bigirin di hejmarên bê de, bi vî awayî bi “Zerî Qubarî” dest pê dikin, hem orjînalê wê hem jî fransiya wê diweşînin di heman metnê de. Di heman hejmarê de Memê Alan bi fransî tê weşandin

û kurmanciya wê tune ye. Beriya “Memê Alan” di bin serenavê “Le Folklore Kurde” de bi kurtasî pênaseya “dengbêj, çîrokbêj, mitirb, sazband û bilûrvan” tê kirin, behsa lehengên kurd û çîrokan tê kirin, bi vî awayî ji ber ku ya herî navdar “Memê Alan” e, ji nav yên din wê dineqînin û beş bi beş diweşînin.¹⁴

Di hejmarên ewil de em bêhtir rastî nivîsên edebî tînin di beşên kurmancî de, lê di yên fransî de em folklor, muzîk, edebiyat an jî çanda kurdan dibînin. Ji vir jî xuya ye, ev beş ji bo biyaniyan hatine nivîsîn an jî dibe ku ji ber daxwaza rewşenbîrên fransî hatibin nivîsîn.

Di hejmara 10an de ji aliyê Dr. G. Michaelian ve nameyek hatiye nivîsîn ji bo pîrozbahîya alfabeya latînî. Di hejmara 13an de ji aliyê Newîn ve bi navê “Le nombre des repas chez les Kurdes” (Hejmara Xwarinê di nav Kurdan de) nivîsek heye ku ev li ser danên xwarinê ye. Di hejmara 14an de nivîsa Kamiran Bedirxan heye li ser Mishefa Reş, afirandina cîhanê û însanan û di hejmara 15an de jî berdewam dike. Di hejmara 16an de li ser çanda êzîdîyan nivîsiye.

Nivîsa Roger Lescot ya di *Hawarê* de cara ewil di hejmara 27an de xuya dibe bi navê “La Berceuse de Fatê” (Loriya Fatê) û di hejmara 28an de bi navê “Chants d’Automne” (Stranên Payîzê) berdewam dike ku tê de kurmancî û fransiya “Pehîzok” û “Paşlavjok”ê nivîsiye. Di hejmara 35an de nivîskarê bi navê Tawûsparêz nivîsa “Melaye Djezirî” weşandiye û li gorî hin çavkaniyan ew Roger Lescot ye (Keskin, 2023: 8-9). Balkêş e ku *Memê Alan* ji aliyê Celadet Bedirxan ve beş bi beş bi awayekî pexşankî hatiye nivîsîn lê di hejmara 36an de bi serenava “La Partie d’Echecs” (Beşa Setrencê) ji aliyê Tawûsparêz ve bi awayekî helbestkî hatiye nivîsîn. Ev beş di pirtûka Roger Lescot (1942: 311) de jî bi heman şêwazî cih digire ku tevahiya pirtûkê jixwe bi vî awayî hatiye nivîsîn û di destpêkê de bi xwe jî dide zanîn ku wî xwestiye beşa setrencê di *Hawarê* de biweşîne. Lewre li gorî ku diyar dike ev beş kêmbû (Lescot, 1942: V). Giringiya Memê Alan ew e, wekî ku Lescot jî diyar dike, çend varyantên çîrokê berhev kirine ku şêwaz û zimanê wan ji hev cuda ne, her wiha her yek bi awayekî kêmbû hatiye vegotin. Dikare bê gotin ku Lescot ev hemû anîne ber hev û bi şêwazeke nû “destaneke kurdan a netewî” ava kiriye, an jî bi vî awayî xwestiye “destaneke kurdî ya netewî” ava bike.

Wexta ku em li naveroka her du kovaran dinêrin, em bi hêsanî dikarin bibînin ku yên ku bi fransî nivîsîne ne tenê Lescot û Rondot ne. Nivîskarên din jî hene ku her yek wekî hejmar çî kêmbû çî zêde be piştgirî dane. Bi taybetî di *Roja Nû* de em dikarin rastî navên cuda bînin. Wekî

¹⁴ Ev xebata Lescot ya li ser Memê Alan ku di 1942an de li Beyrûdê ligel wergera wê ya fransî hatibû çapkirin, di 1997an de bi kurdî li Tirkiyeyê jî hat çapkirin. Bnr. Lescot (1997).

mînak di *Roja Nû* de nivîskarekî bi navê René Boisseau (1943: 3) di hejmara ewil de behsa guherandina alfabeya kurmançî dike û ji xeynî vê behsa Roger Lescot dike ku dibêje di bin banê Enstîtuya Fransî ya Şamê de bi navê “Textes Kurdes” (Metnên Kurdî)¹⁵ folklorê kurdî werdigerîne fransî da ku yê bi kurdî nizanin bikaribin bixwînin. Ji vê şiroveyê jî em dikarin bibêjin ku Lescot ne tenê “destaneke kurdî ya netewî” ava dike, lê di heman demê de jî dixwaze çanda kurdan bi biyaniyan jî bide naskirin.

Wekî ji hejmarên *Roja Nû* tê xuyakirin, ne tenê yê naskirî wek Lescot, lê belê hinek nivîskarên din ên fransî jî di rojnameyê de nivîsandine. Wek mînak di beşên fransî yê *Roja Nû* de derbarê şer de nûçe hene ku ji aliyê E.B ve hatine nivîsîn -di hejmara 4an de paşnavê wî wekî Berlan hatiye diyarkirin-. Her wiha metnên folklorîk ên ku ji kurdî hatine wergerandin jî hene. Kamiran Bedirxan ku wek Dr. Bedir Khan hatiye nivîsandin, wergerên helbestan kirine, Roger Lescot jî çîrokên kurdî adapteyî fransî kirine û stran wergerandine.

Bi heman rengî di hejmarên cuda de em rastî navên din jî tên. Di hejmarên 6, 7, 8, 9 û 20an de nivîskareke jin a bi navê *Lucie Vidal* bala me dikişîne ku wê jî bi piranî derbarê şer de nivîsiye. Ji xeynî şer, berê xwe daye edebiyatê jî ku di hejmara 25an de behsa jiyana La Fontaine, di 28an de behsa Voltaire, 39an de jî behsa Shakespeare kiriye. Bi vî rengî jî xwînerên kurd ên van kovar û rojnameyan rastî mirata çandî ya rojava dibin. Lewma jî dikare bê gotin ku bi riya van kovar û rojnameyan têkiliyeke *dualî* ya çandî jî hatiye avakirin.

Ber bi dawiya hejmaran ve nivîs berê xwe ji yê şer didin dîrok û çanda Kurdistanê. Wekî mînak nivîskarekî bi navê Robert Surieu di navbera hejmarên 40-45an de derbarê Kurdistanê de dinivîse û ev beş piraniya rûpelê dadigire. Ber bi dawiya hejmaran ve em rastî navê Thomas Bois tên.¹⁶ Nivîsa wî ya ewil a ku di hejmara 53yan de derketiye, li ser Cegerxwîn e û di hejmara 56an de jî li ser Cebel Sîncarê (Çiyayê Şengalê) nivîsiye.

Dîsa di çend hejmarên dawî yê *Roja Nû* de em rastî nivîskarekî din tên ku navê wî Mansour Chalitta ye. Chalitta di hejmarên 65, 68, 70-71ê de nivîsîne û nivîsên wî derbarê welat, ziman û cîranên kurdan in, ji xeynî vê derbarê pirsgerêka parçebûna kurdan û çareseriyê vê jî nivîsiye. Di çavkaniyan de derbarê Chalitta de zêde agahî tune, lê em dikarin bibêjin ku di

¹⁵ Wergerên kurdî ya van xebatên Lescot wek Memê Alan (1997) û Lawê Pîrê (2023) ji aliyê weşanxaneyê Avesta ve hatine çapkirin.

¹⁶ Thomas Bois derbarê kurdan, zimanê kurdî û folklorê kurdan de jî berhem çap kirine. Ya herî tê naskirin “The Kurds” e ku di 1966an de wergera wê ya îngilîzî hatiye çapkirin. Pirtûk pêşî di sala 1965an de bi navê “Connaissance des Kurdes” bi fransî tê çapkirin.

wextê xwendekariya xwe de ji bo *Roja Nû* nivîsiye, lewre di 1919an de li Kolombiyayê hatiye dinyayê û li Beyrûdê xwendiyê.¹⁷

Ji aliyê din di rojnameyê de gelek nivîsên fransî jî bê nivîskar in. Çi bi nav çî bê nav be, di *Roja Nû* de li ser mijarên curbicur gelek nivîsên bi fransî hatine weşandin. Nivîsên bi vî rengî -yên fransî- gelek giring in ji bo belavkirin û naskirina kurdan di nav rojavayîyan de bi taybetî ji aliyê çand û dîrokê ve.

Piştî Şerê Cihanê yê Duyemîn, di 1946an de Fransa leşkerên xwe yê dawî jî ji Sûriyeyê wedikişîne û li şûna wê dewleteke serbixwe ya bi navê Sûriyeyê tê damezrandin, lê ev rûdan têkiliya rewşenbîrên fransî bi kurdan re qut nake.

Ew têkiliyên ku li Şamê, di dema mandatiyê de hatibûn danîn, piştî pêvajoya mandatiyê ku di 1946an de diqede jî dewam dike. Roger Lescotê heval û hevkarê Celadet û Kamiran Bedirxan, piştî şer vedigere Parîsê û li *Fakulteya Netewî ya Zimanên Zindî yê Rojhilatê* (ENLOV- piştî dibe INALCO) bo kurdî kursiyekî vedike. Piştî ku ji bo karê xwe yê fermî diçe Qahireyê jî cihê xwe dide Kamiran Bedirxan ku heta teqawûdbûna xwe li wir ji bo karên kurdî dixebite.¹⁸ Ev têkiliyên ku di navbera 1930-46an de li Şamê hatine danîn, li Parîsê jî dewam dike û her wiha dibe bingeh ji bo damezrandina *Enstîtuya Kurdî ya Parîsê* ku ew jî dibe mekan û dibistanek ji bo xwendekar û lêkolêrên kurd.¹⁹

Encam

Serdema dawî ya Împaratoriya Osmanî dikare wekî serdema guherînan bê pênasekirin. Fikr û tevger, jê wêdetir nivîs û weşan berê rewşenbîran dide xebatên wekî netewetî û bipêşketinê. Lê helbet ji aliyê rewşa siyasî ya serdemê ve avakirina tiştên nû ne ewqas hêsan bûn. Ji ber vê yekê jî gelek ji rewşenbîrên kurdan mişextî welatên din bûn. Sûriye yek ji van welatan bû ku rewşenbîrên kurd gihandin hev.

Hin ji endamên Malbata Bedirxaniyan jî li Sûriyeyê bi cih bûn û xebatên ku di nêvî de hiştibûn, xwestin li wir berdewam bikin. Li wir rasthatin û hevnasîna wan a rewşenbîrên fransî derfeteke mezin da wan, lewre bi saya wan -bi taybetî ji aliyê aborî ve- Celadet û Kamiran Bedirxan kovar û rojname derxistin û bi saya van weşanan nixêrên kurdî yê folklorîk bi awayekî

¹⁷ <https://wlcui.com/2014/01/12/mansour-challita-the-lebanese-lord-of-brazilian-words/> (Lênêrîn: 28.08.2024)

¹⁸ Ji bo agahiyên derbarê vê pêvajoyê de bnr. Joyce Blau (2019).

¹⁹ Agahiyên berfireh derbarê enstîtuyê, dîrok û çalakiyên wê ji malpera wê dikarin bîn wergirtin. Bnr. <https://www.institutkurde.org/ku/> (Lênêrîn: 31.07.2024).

nivîskî tomar bûn. Ji xeynî vê, bingeha rêzimanê hat danîn di *Hawarê* de. Lê *Hawar* ne tenê bingeha zimanê kurdî ya îroyîn danî û ew ji nû ve zindî kir, di heman demê de ew bû mal ji bo şair, dengbêj, nivîskar û rewşenbîrên kurd û bi vê yekê jî di geşedana entelektuelî ya kurdan de bu xwedî cihekê sereke. Heman tişt ji bo *Ronahî*, *Stêr* û rojnameya *Roja Nû* jî dikare bê gotin.

Rola rewşenbîrên fransî yê wekî Roger Lescot û Pierre Rondot gelekî mezin bû di van weşanan de. Ango em nikarin bibêjin ku bi tenê alîkariya aborî hat dayîn. Alîkariyên jê wêdetir hatin dayîn. Wekî mînak ew bi xwe jî li ser çand û folklorê kurdî xebitîn û çî bi kurdî çî bi fransî nivîs û berhemên giring weşandin. Bi saya van xebatan di qadên cuda de bingehê hat danîn. Ji xeynî vê, xebatên wan ên hevpar ên ku bi Birayên Bedirxanî re kirin, xebatên bingehîn bûn û di dîrokê de cihê xwe girtin.

Em dikarin bifikirin ka gelo bêtir alîkariya van kesan dê ev berhem derketana an na? Em teqez bersiva vê nizanin lewre jixwe bedirxanî jî her dem di nav xebat û weşanan de bûn û Celadet Bedirxan jî hê ji berê ve bingeha alfabeya xwe danîbû. Lê dibe ku bi alîkariya rewşenbîrên fransî ev pêvajoyên hêsantir çêbû û dirêjtir berdewam kir. Wekî li jor jî amaje pê hate kirin, ew têkiliyên li Şamê hatibû danîn, piştî pêvajoyê mandatîyê li Parîsê jî dewam kirin. Dîsa bi piştgirî û alîkariya rewşenbîr û rêvebirên Fransî li ENLOV (piştî dibe INALCO) kursiyekî kurdî vedibe, Kamiran Bedirxan li wir dersan dide, têkiliyên nû çêdibin û ev hemû rê li ber damezirandina Enstîtuya Kurdî ya Parîsê vedike ku dibe mekan û dibistan û her wiha arşîva xebatên kurdî. Lewma jî têkiliya rewşenbîrên fransî bi yê kurd re ku di salên 1930î de dest pê dîke, hem dihêle ku xebatên kurdî pêş bikevin û hem jî bi saya weşanên wekî *Hawar*, *Ronahî*, *Stêr* û *Roja Nû* dihêle ku rewşenbîriya kurd pêş bikeve.

Çavkanî

- Alakom, R. (1988). *Hoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması*. İstanbul: Avesta
- Bedirhan, C. A. (1995). *Günlük Notlar*. Stockholm
- Bedir-Xan, C. A. (1998). *Gazinda Xencera Min*. (Amd. F. Cewerî) *Hawar*, 1 (12), 519-520.
- Blau, Joyce (2019). Emir Kamiran Bedirxan'ın Anıları. Di nav: *Kamiran Alî Bedirxan (1895-1978) (wer. H. Bucak & H. İlhan)*. İstanbul: Avesta de, r. 61-81.
- Bois, T. (1966). *The Kurds*. Beirut: Khayats
- Boisseau, R. (1943). Roja Nu (Le Jour Nouveau). *Roja Nû* (1), 3.

- Bozarslan, H. (2001). Correspondance des frères Bedir-Khan et Pierre Rondot. *Etudes Kurdes* (3), 73-98.
- Celil, C. (2000). *Kürt Aydınlanması*. (wer. A. Karabağ). İstanbul: Avesta
- Durmuş, İ. (2000). L INSTITUT FRANÇAIS des ETUDES ARABES Şam'da kurulan Arap araştırmaları enstitüsü. *TDV*. c.22, r. 333-334. <https://islamansiklopedisi.org.tr/institut-francais-des-etudes-arabes> (Lênerîna dawî: 31.07.2024).
- Elisséeff, N. (1958-1960). L'Oeuvre Scientifique de l'Institut Français de Damas 1930-1960. *Bulletin d'études orientales*(16), 101-118.
- Filiz, M. Ş. (2023). *Roman Diliyle Kürtler: Marksizm, Milliyetçilik ve Feminizm Bağlamında Üç Özgürlük Anlatısı*. İstanbul: Peywend
- Fuccaro, N. (2004). Minorities and ethnic mobilisation: the Kurds in northern Iraq and Syria. N. Méouchy.-P. Sluglett (Ed.) içinde, *The British and French Mandates in Comparative Perspectives/Les Mandats Français et Anglais Dans une Perspective Comparative* (s. 579-595). Boston: Brill.
- Gay, P. (1969). *The Enlightenment: An Interpretation. Vol II: The Science of Freedom*. New York: Alfred A. Knoph Inc.
- Gorgas, J. T. (2006). Les constructions de l'identité kurde sous l'influence de la « connexion kurdo-française » au Levant (1930-1946). *European Journal of Turkish Studies*(5), 1-25.
- Gorgas, J. T. (2014). The Kurdish Cultural Movement in Mandatory Syria and Lebanon: An Unfinished Project of "National Renaissance," 1932–46. *Iranian Studies*, 5(47), 839-855.
- Gorgas, J. T. (2020). *Kürt Milli Cemiyeti Xoybûn: İlk Milliyetçi Kürt Örgütüne Dair Efsaneler ve Gerçekler*. (çev. H. Bucak) İstanbul: Avesta.
- Hosford, D. & Wojtkowski, C. J. (2010). *French Orientalism: Culture, Politics, and the Imagined Other*. Cambridge Scholars Publishing
- Henning, B. (2021). *Osmanlı-Kürt Bedirxani Aile Tarihinin İmparatorluk ve İmparatorluk Sonrası Bağlamındaki Anlatıları: Devamlılıklar ve Değişimler*. (çev. İ. Bingöl) İstanbul: Avesta.
- Jwaideh, W. (2004). *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi* (çev. İ.Çeken-A.Duran), 3. bsk., İstanbul: İletişim

- Kant, I. (2024). Aydınlanma Nedir? Sorusuna Yanıt. <https://mkaymak.wordpress.com/aydinlanma-nedir-sorusuna-yanit-2/> (Lênerîn: 28.08.2024).
- Lescot, E. D. (1970). *Grammaire Kurde (Dialecte Kurmandji)*. Paris: Librairie d'Amérique et d'Orient Adrien Maisonneuve.
- Lescot, R. (1942). *Mamê Alan*. Beyrouth: Institut Français de Damas Collection de Textes Orientaux.
- Lescot, R. (1997). *Memê Alan: Destana Kurdî*. Stenbol: Avesta
- Lescot, R. (2023). *Textên Kurdî: Lawê Pîrê*. (Ed. N. Keskin) İstanbul: Avesta.
- Lockman, Z. (2004). *Contending Visions of the Middle East: The History and Politics of Orientalism*. Cambridge University Press
- McDowall, D. (1998). *The Kurds of Syria*, London: KHRP.
- Métral, J. (2004). Robert Montagne et les études ethnographiques françaises dans la Syrie sous mandat. Di nav: N. M. Sluglett (Ed.). *The British and French Mandates in Comparative Perspectives/Les Mandats Français et Anglais Dans Une Perspective Comparative* (s. 217-234). Boston: Brill.
- Noel, E. W. (2013). *Kürdistan 1919: Binbaşı Noel'in Günlüğü*. (çev. B. Birer) İstanbul: Avesta.
- Özoglu, H. (2004). *Kurdish Notables and the Ottoman State: Evolving Identities, Competing Loyalties, and Shifting Boundaries*. New York: State University of New York Press
- Rondot, P. (1939). *Les Kurdes de Syrie*. Extrait de la France Méditerranéenne.
- Sebrî, O. (2012). *Hatıralarım*. (çev. A. Koçal). Diyarbakır: Lîs.
- Schmidinger, T. (2015). *Suriye Kürdistanı'nda Savaş ve Devrim- Rojava'dan Sesler ve Analizler*. (çev. S. Altınçekiç). İstanbul: Yordam Kitap
- Tejel, J. (2011). Scholarship on the Kurds in Syria: A History and State of the Art Assessment. *Syrian Studies Association Newsletter*, 16 (1), 1-10.
- Tejel, J. (2015). *Suriye Kürtleri: Tarih, Siyaset ve Toplum*. (çev. B. Koç) İstanbul: İntifada Yayınları.
- Uzun, R. B.-M. (2020). *Banyas 1985: Rewşen Bedirxan-Mehmed Uzun Sohbeti ve Mektuplar*. İstanbul: Avesta.

Wright, S. (2016). French: The Rise and Fall of a Prestige Lingua Franca. Di nav: *Language Policy and Language Planning*. Palgrave Macmillan, London.

https://doi.org/10.1007/978-1-137-57647-7_6

Wright, S. (2006). French as a Lingua Franca. *Annual Review of Applied Linguistics*. pp. 35–60.